Fırat Ceweri

# ÊRÎŞ DIKIN




Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

**Fırat Cewerî**

K.L. 2535 (2)

# ÊRÎŞ DIKIN

922 CEW ERI

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Institut kurde de Paris

1981 -01- 21

Institut kurde de Paris

Her wekî ku Hoşîmînh dıbêjê...
Emê Vîetnamekî
Nû û bedewtır
avakın!..

Her emê
Kurdîstanek nû
Û cîhanek bedewtır
avakın!..

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# T Ê X I S T I N


Serbûrîyek .................... 7
Mın dıvê şoreş .................... 20
Bo azadî bı yek bın .................... 21
Ser soza xwe nayêm xwarê .................... 24
Bo mın xema mexwun .................... 26
Yekbûn gıra dıxîne .................... 27
Em tev bang kın bo kurdîstan .................... 28
Hûnê bıkevın .................... 29
Nawestım .................... 31
Lı mın bı lı vî halê mın .................... 32
Te ez helandım .................... 33
Megrî .................... 34
Werın .................... 35
Bımeş bra .................... 36
Prolêtarım .................... 38
Mın dıvê wabe .................... 41
Êrîş dıkın .................... 43
Me dıvê serbestî .................... 44
Kedfroşım .................... 45
Ku kurekî mın çê bıbe .................... 46
Bonî çı hatın .................... 49
Werın bı me ve .................... 52


Institut kurde de Paris

Carek zept bıkım.......... ........54
Bıla fedî bıkın......................55
Sıbekê...............................56
Ez wana nasdıkım.....................58
Rê ya te pê keve.....................59
Daxwazya mın ya talî.................60
Evîna mın............................61
Bı çwîkek bûma ......................62
Azadî xwązım.........................64
Tu jî were dayê......................69
Kanî.................................70
Dıvê êdî.............................71
Ma ez tenê...........................72
Jı şehîdên nemır re..................73
Dı hundurkî demım....................74
Bonî însana..........................76
Darengım.............................77
Şîret................................79
Mêrê mın.............................80
Jına mın ............................83
Çıma bejın zıravê....................85
Du nêçîr heye........................87
Institut kurde de Paris

## SERBÛRÎYEK

Ez û dîya xwe
Pîra kevne jın
Lı hev rûnıştın
Me gazın kırın
Me jı hev re got
Wer em bıbne cot
Û em bıgerın
Bırçî û serqot
Dûvre fıkırî
Û wê gote mın
go ev wa nabe
Nabe kurê mın
Dıvê em malî
Lı hev bıcıvın
Hıngî em dıdo
Jı mal bılıvın
Lı me bû êvar
Şîva me şorbe
Dîya mın rabû
Wê vekır torbe
Torbe pır kevn bû
Tev kufuk û toz
Bavê mın ponıjî
Wî dalıqand poz

Institut kurde de Paris

Dı nav torbe de
Hebûn pır ewraq
Gotnên kalkê mın
Pır şîretın pak
Bavê mın rabû
Dest avête wan
Go vana çının
Bıxwînın quran
Kete nav malê
Nexweşyak mezın
Dîsa dê ya mın
Jı mın kır gazın
Hın bûn pêşverû
Hın man paşverû
Mın rahışt pênûsê
Û derketım zû
Ez ketım rê û
Ez çûm gundekî
Bı tenê dımeşım
Wekî kundekî
Dı wê rê de roj
Lı mın bû êvar
Çûm ser çemekî
Mın av jê vexwar
Mın dî xwışînek
Jı ber mın helat
Marekî ser reş
Bı ber mın de hat



Institut kurde de Paris

Ez pırî tır s'yam
Por lı mın gıj bû
Jı wır ez rabûm
Û revîyam zû
Bı lez dımeşım
Lı paş xwe nanerım
Dı çol beyar de
Bê ronî darım
Hîn dılezînım
Jı tırs û xofa
Lê xwe dıjdînım
Dımeşım bı dafa
Şev lı mın gerya
Û mın rê şaş kır
Mın dî jı dûr ve
çrûskek agır
Mın î xwe lê gırt
Û ez meşîyam
Ez î weke mar
Jı hev kışî yam
Ez nêzîk bûm û
Mın baş lê nerît
Mın dî wenda bû
Mın î hew ew dît

Institut kurde de Paris

Lê ez pır hêrs bûm
Mın go:tu kîyî?
Dı dılê xwe de
Mın go gundî yî
Bêhnek dın meşyam
Ketım ser rê kê
Rê yek duv dırêj
Zırav wek kêr kê
Dı wê rê de mın
Hebıkî lezand
Jı seyda yê xwe
Mın helbestek xwand
Mın dî nêzîk bûm
Rastî du reşa
Destê spê ye
Seet tê şeşa
Mın bang kır lo...lo!
Ka bısekının
Hûn çı dıfroşın?
Hûn çı dıkırın?
Ew sekının û
Gote mın were
Ma tu vê spê
Lı çı dıgere?

Institut kurde de Paris

Çûme cem wana
Kerê wan bı bar
Cemek pırtûk bû
Yek jî kul û jar
Cığarak pêçan
Cığarak qalınd
Wan dane dest mın
Go tu vexwe rınd
Mın ew cığare
Rahıştê û kışand
Mın pırtûkek jî
Rabû jı wan stand
Mın vekır û xwand
Ez î pê hêrs bûm
Jı kerba lı wır
Dı cî de gêj bûm
Wan ez pelandım
Bı ser xwe de bê
Ew jî wekmenın
Bırçî û bê dê
Êdî şîret kır
Û jı mı r' xwandın
Hın fıkır da mın
Hın jı mın standın

Institut kurde de Paris

Em bûne hevra
Em hatın ber gund
Dengê melê wan
Gûr dı bû bılınd
Dı pozê gır de
Roj bılınd dı bû
Tîrêjê rojê
Ew belav dı bû
Dengê şalûl û
bıl bıl û blûr
Bı nalîn dehat
Bı dengekî kûr
Lı ser sergo wa
Ker û golıka
Tevdë dılîstın
Dı dan lotıka
Dîka lı hev dıdan
Kûçık dıreyan
Ên dew dukulan
En dukutan dahn
Hatın pêşya me
Du mendal jı gund
Gon dıvê hûn herın
Wê qesra bılınd

Institut kurde de Paris

Me xwe lı qesrê gırt
Em bı jor ketın
Mın dî jı qesrê
Sê kes derketın
Yek jı wan Mele
Muxtar û Axa
Gon: fermo derbas bın
Hûn ser kulava
Em ketın hundur
Em rûnıştın xweş
Hunguv û nîvhışk
Û anîn şebeş
Dûvre pırsîn û
Wan jı mere got:
Ev gund ê me ye
Emın melkemot
Lêez pır hêrs bûm
Ezî xwîn germ bûm
Jı kerba xwêdan
Dı mın dë der bû
Dîsa peyıvîn
Keya go: Mele
Dûwanzde ılme
Başe jı me re

Institut kurde de Paris

Axa vegerand
Wî gote muxtar
Peyv jêr tune ye
Bo gund dıke kar
Mele û muxtar
Herduwa gotın
Tew jı axê re
Tune ye gotın

Rabûm dest avê
Çûm paş qîşıka
Pêrgî gavan bûm
Meşîm hêdî ka
Wî tûr avêt û
Xwe avête mın
Gote mın bıjî
We naskır dujmun
Lı ser rewşa gund
Em raberızîn
Jı stembarî
Wî got em rızîn
Mın pır ceng dıyî
Lo...lo brazî!
Ne bo azadî
Û serfırazî

Institut kurde de Paris

## Mînakî Qorê

Lı hember Yunan
Û talî nêzîk
Lı çayê berzan
Ne bo Azadî
Ne wek Vîetnam
Weke kû hêrs bû
Enî qermıçî
Rıcıfî û got:
Qey emın bırçî?
Destê xwe hılda
Avê t'pışta mın
Got:şerê talî
Lı dıjî Dujmun
Dıvê ronakbîr
Xortên wekî we
Tım bı rêzan bın
Bo xelas ya me
Û duvre hêdî
Dev xıst Guhê mın
Got:bıla nebıhîze
Pîsê Axê Gund

Institut kurde de Paris

Her qedexe ye
Bo me gundî ya
Axaftına beyî
Axa û Keya
Mı got:mın fêm kır
Ey apê delal
Bonî serxwe bûn
Her em dıkın kar
Mın xatır jê xwast
Ez çûme odê
Tune bûmele
Gon:wê 'neha bê
Em kêlîkê man
Fıravîn dan ser
Mın dî gırînek
Û şewqeka zer
Sê cemse Leşker
Tev bı çek û rext
Axa û Muxtar
Û melê bê bext
Glî kırın wan
Leşker berdan Gund
Da b'gırtın bı dın
Me tev fıkrên rınd

Institut kurde de Paris

Berî dan odê
Leşker ên bı gır
Bı tırkî gotın:
Derkevın j'hundur
Dora me gırtın
We k'kulyên Şamî
Mın tıfkır Axê
Tu ne zılam î
Wana em gırtın
Teva pırtûka
Lı cemsê kırın
Em bırın zûka
Bonî çı Axa?
Mele û Muxtar ?
Dostên dewlemend
Dujmun ên dıjwar
Ger nıjadekın
Em û hûn tevde
Fermo! vırde wer...
Hûn neçın wır de
Lewra hûn nayên
Hûn tev semsarın
Bo bûçûwazî
Hûn dest bı karın

Institut kurde de Paris

Bı gırtın Zîndan
Hûn baş zanı bın
Ne M'vedıgerın
Ne poşman dı bın
Em xwendevanın
Ronakbîrın em
Dışkînın Zıncîr
Her dışkînın gem
Dîsa zanı bın
Her hûnê dabın
Teva bavên xwe
Hûnê wenda bın
Çavên me vebû
Me Cîhan nas kır
Jı bareş bıgre
Ta bıçe bakûr
Henın dostên me
Û pırın dujmun
Lê jı dujmun re
Hûn jî bû ne jın
Êdî çı bêjım
Şerme jı were
Namûs û zman
Dı dın bı perë

Institut kurde de Paris

Pırî ponıjîm
Û mın xwend pırî
Nav pîyê me de
Hûn bûne drî
Bı gırtın lêdan
Bı heps û zîndan
Em xwdî dozın
Bı xwîn û xwêdan
Em dılezînın
EM xwe dıjdînın
Dıkın em bıvır
L 'zıncîrê xînın
Lo hıngî hun jî
Hew l'cîhan dıjî
Ne ew qelafet
Ne heş ne mejî.

Institut kurde de Paris

# MIN DIVÊ ŞOREŞ

Ne ker û korım
Ne î çav sorım
Welat parêzım
        mın dıvê şoreş
Bonî her kesî
Her jıbon me jî
Bı heş û mejî
        mın dıvê şoreş
Bırîn dıjwarım
Bê cî û warım
Bı kul û jarım
        mın dıvê şoreş
Bonî şevên reş
Da roj lê bıwe ş'
Ezım welat hez
        mın dıvê şoreş
Berî nan û av
Her dem û her gav
Bo vê şîva xav
        mın dıvê şoreş
        mın dıvê şoreş.

Institut kurde de Paris

## BO AZADÎ BI YEK BIN

Bese êdî hûn bıdın deng
Bo aşîtî hûn deynın ceng
Û hûn jı dıl rajın tuven g'
bo aşîtî
bo azadî

Bang û qîr û bı gazî kın
Hûn vê avê lı her alî kın
Bes mırîşk tî êdî bı dîk bın
bo aşîtî
bo azadî

Bıkın lîlî bı hêrs bıbın
Da kû êdî hûn têr bıbın
Wek pılıng û wek şêr bıbın
bo aşîtî
bo azadî

Bı nıfşara hûn meşî yan
Daxwaz bıbın tım bo jîyan
Rabın ser xwe bıbın beyan
bo aşîtî
bo azadî

Institut Kurde de Paris

Bı nalîn û tım bı grî
Hûn vî berî nabın serî
Bı ceng deng bı d' her derî
bo aşîtî
bo azadî
Xwe jı qeydê bıfılıtî n'
bo hûn şewqa rojê bıvî n'
Dı ser wan de gra bıxwî n'
bo aşîtî
bo azadî
Nebên eyb û nebên gune
Nebên mêr û nebên jıne
Bıla hedan lı we nîn be
bo aşîtî
bo azadî
Ser sînora r' bang hevdû kım
Bes bındes bın bes pepûk bın
Bê tırs bıbın weke hût bın
bo aşîtî
bo azadî

Institut kurde de Paris

Çav bernedın malê kesî
Bı kın xebat hûn bı heşî
Jı dujmun re nebın mejî
bo aşîtî
bo azadî

Lı hev vege r'lı hev kom bın
Jı hevdû re her dem dost bın
bıbın destek bı yek doz bın
bo aşîtî
bo azadî

Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

## SER SOZA XWE NAYÊM XWARÊ

Derd û kul û tenayî
Va ye dîsa bû xwuyayî
Jı te dûr bûn te nedî tın
Ew lı ber mın tım raza yî

Felek çıma tu yî her dem
Lı mın rû tal neyî bı dev ken
Ser mın gerî û tım fen
Şerme jı te r' felek pır şerm

Ez bang dıkım bang evînê
Kanî sozê lı ser jînê
Qey felek lı te jî gerya?
Lê rebenê hêsır xwînê

Megrî dostê evqa menal
Ser soza qet nayêm xwar
Tu bawer be her dem lı mın
Jı te pêde qet naxım mal

Institut Kurde de Paris

Tu vê fıkrê baş bıfıkır
Tu jî wek mın bıjde jı dıl
Wer em sozê xwe yî kevın
Bıcî bînın îro bêtır...

Institut kurde de Paris

## BO MIN XEMA MEXWUN

D ayê menal bo mın megrî
Ez dıgerım lı her derî
Da şıvan bım bo vî kerî
Ez dıxwînım ez dıgerım

Yabo berde vî hevfsarî
D a k'êdî em herın serî
Bo nemîne hev hemberî
Ez dıxwînım ez dıgerım

Êdî bo mın qet nexwun xem
D îrok dıbê hatîye dem
Va namîne dızî û fen
Bıkın xebat û bınerın...

Institut Kurde de Paris

# YEK BÛN GRA DIXÎNE

Gelî xuşka hûn rabın
bıme re dest bıra bın
Beyî we kar û xebat
Em bı şoreşê şanabın

Erê bra wek te got
Em bı hevre bıbın cot
Bı rext û tıvıngên xwe
Em herın ser melkemot

Dujmun nabên xort tenê
Me dımıjın wek genê
Ew qufl û zıncîrên wan
Em bışkînın jı dınê

Bra qîz û xort çının
Em tev ê welat kînın
Va çıra lı me vêket
Em ên dê û bavkînın

Institut kurde de Paris

## EM TEV BANGKIN BO KURDISTAN

Bıne r'bra jı we bêtır
Bı stran û jı we hêltır
Hım bı grî hım bı hınır
Bangdıkın em bo Kurdıstan

Erê xuşkno hûn her bıjî
Erd û Cîhan va dıhejî
Xebat nahêle ser gêjî
Em tev bangkın bo Kurdıstan

Institut kurde de Paris

## HÛNÊ BIKEVIN

Em bı cejn û jîn
Hûn bı curm û xwîn
Ev wıha nare
Hûnê xwe bıbî n'
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın

Em maf parêzın
Hûn maf dımêjın
Dîrok baş zane
Hûn ne dırêjın
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın

Hım lı nav erdan
Hım lı kargehan
Tev em kırêkar
Dırjînın xwêdan
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın

Institut kurde de Paris

Emın mıl hesın
Ho ên zık mezın
Em bonî kedê
Pır zû dılezın
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın
Me dıvê yekbûn
Her kes wekhev bûn
Lê hûn tım û tım
Dıbên em embûn
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın
Emrê weyî kın
Vaye carek dın
Wê her bıbînın
Zaro mêr û jın
hûnê bıkevın
hûnê bıkevın

Institut kurde de Paris

NAWESTIM

Ez jı dema kevın de mım
Gelekî zulm, çêbû lı ser mın
Qet mın negot ez westîyam
Û ez î tım dı'şer de mım.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE
Institut kurde de Paris

## LI MIN BI LI VÎ HALÊ MIN

Ez xwasım bê pêlavım
Ez bê dê û bê bavım
Hım bê berçavk û çavım
        lı mın bı lı vî halê mın
        lı  mın bı lı vî halê mın
Ez bê xanî û malım
Ez bê cî û bê warım
Hım bê dost û hevalım
        lı mın bı lı vî halê mın
        lı mın bı lı vî halê mın
Ez betalım bê karım
Ez bê lûs û bê yarım
Hım ez bırîn dıjwarım
        lı mın bı lı vî halê mın
        lı mın bı lı vî halê mın

Institut kurde de Paris

## TE EZ HELANDIM

Ew çavên te y' reş î bı kıl
Bo mın, her dem dıbe aqıl.
Be s'tîrêja tu berde dıl
te z'helandım
te z'helandım
Me da hevdû carekê soz
Tevde bona jîneka xoş
Te ez kuştum kırım berdoş
te z'helandım
te z'helandım
Sozdarya me L'ser evînê
Ne bo dıl kul bonî jînê
Be s'bımıv we r'lê xaînê
te z'helandım
te z'helandım

Institut kurde de Paris

MEGRÎ...

Megrî mendalo!
Tu meke îskîn
Çelengo! megrî
Bes bınuhurîn
Jı te re destmal
Jı te re paçık
Paqıj bı ke tu
Çavên xwe î mûç
Gazına meke
Jı ên dev bı xwîn
En xeradıkın
Hêlkan û hêlîn
Ewrê reş tarî
Va belav dı be
Ser Mendala jî
Ew mıj radıbe
Serê xwe hılde
Jı te re mızgîn
Tê hêlkana xwe
Dîsa bıhejî n'

Institut kurde de Paris

Bıde lotıka
Edî bıkene
Bı xêr pîroz be
Jı te re ev jîn

## WERIN

Werın, werın
Jı mın nerevın
Hezkırê însana me,
Ked froşım ez...

Institut kurde de Paris

## BIMEŞ BIRA

Ev xaçırêk na
Xaçırêk nê bı zîvronek
        bı kevır,
          bı strî,
            bı qember,
Bı têl û kelem.
Bımeş...
Bımeş bıra bê westandın
Bımeş her gav
Bımeş her dem
Bê betıl û sekın
Bımeş...
Bımeş da tu bıghê
Kurt nebıre
Tu rast bımeş
Venegere jı ser wê rê

Pır dengên hêl
Pırî gazî
Pırî waj...waj
Pırî mıj û dûxane

Institut kurde de Paris

Çavên xwe ve k'
Vek, çavên xwe tu her ser wî
Tu dı wê rê de ne poşmanî

Bıte zanım. tu brûskî
Tu we k'ewrên bıharê
Bıte zanım, tu bızotî
Weke ê qurmên darê
Bıte zanım, tu xıramî
Tu tucar nake v'xwarê
Dî s'bawerım
Tu dıfûre dı ser hev re
Tû weke pêlên bahrê
Te tu nehışt
Tu gîha serê serkaş
Belê tenê
Herî û çırav
Ma lı ber te ewa deh gav
Bê sekın û tırs
tu bı nav de
Û şelwar hılde derkeve jı nav

Institut kurde de Paris

## PROLÊTARIM

Prolêtarım
Xwarın,
Lı xwe kırın,
Vexwarın,
    kêf,
     meş
      û ger
War avakırın
Ez dıafırînım.
Pêktînım ez.

Le tu?
Tu hustu qalınd
Zık mezıno
Tu çı dıkî?

Dîsa ez
    jı axê,
        jı avê,
Jı agır dıafırînım hesın.

Institut Kurde de Paris

Û dı hêtûna de
Dıhelînım hesın
Jı hesın dırêçînım navgîn
Navgînen hılberînî.

Le tu?
Tu hustu qalınd
Zık mezıno
Tu çı dıkî?

Prolêtarım
Av,
avanî,
çem û Kanî,
Derbend û ronayî,
Froke,
Trên
û tırımpêl
Ez dıafırînım.
Pêk tînım
Ez.

Institut kurde de Paris

Le tu?
Tu hustu qalınd
Zık mezıno
Tu çı dıkî?

Tu çı dıkî?
Êrîş parêzê pîs
Jakawê...jakaw
De ka bêje
Tu çı dıkî?

Institut kurde de Paris

# MIN DIVÊ WABE

Şev tarî bû
reş bû
dırêj bû
Sar bû wê şeva reş ya dırêj.
tax bê deng
mal bê deng
bajar bê deng
Lê ker û gêj
Bı tenê bûm
Dı kuça tarî de
Kuça teng
ya bê hıs
ya bê deng

Hew mın nerî
Wek tu xwê bavê agır
Hım...hım
Gır...gır

Institut kurde de Paris

Jı alîkî ber dıbarın jı hewa
Wek bızotên agır
Jı alîkî jî leşker tên bı refa
Bı gır,
Jı devê wan dehare agır
Û jı alî yê dın jî
Qîrîn bı bajar dıkeve
We k'kû bırqek jı ezman bê xwar
Wısa bı deng
Wısa dıjwar

Bajar rabû
Mal şîyar bûn
Tax bı deng
Lê,dı cî de
Ez jî hol bûm
Mın jî êdî xwaste ceng

Institut kurde de Paris

## ÊRÎŞ DIKIN

Êrış dıkın
Dayê wana
Her dem êrîş tînın ser me

Bı wan destên pîs î qırêj
Dest davêjın gepa me

Xera dı kın
Dayê wana...
Malok û holîkên me

Bê je dayê
Çıma wana?
Bı gır,
Êrîş tînın ser me...

Institut kurde de Paris

## ME DIVÊ SERBESTÎ

Em keçên kurd,
Bı kurtayî
Me jî dıvê,jînek xweş...

Me jî dıvê,
Bı bûkanî
Lı dar bıbe dawetek geş...

T amûl nakın,
Jı sê zulma bındestî...

Em jınên kurd,
Me jî dıvê serbestî...

Institut kurde de Paris

## KED FROŞIM...

Ked froşım
    dıl sozım,
     xwedî dozım,
Ne tenê xwe parêz,
Ne jî xwe froşım.

Bo pêşketına hılberîn
Hêz...
Bo pêşketına hêzên hılberînî
Qevz...
Û bo gırtına
        navgînên
          hılberînî
Hozım.
Ked froşım
Ne tenê xwe parêz
Ne jî xwe froşım

Institut kurde de Paris

KU KUREKÎ MIN ÇÊBIBE

Kû kurekî mın çêbıbe
Dıvê kû
Bı bırayên xwere Bırader
Bı xweha xwere hevra
Û bı hevalên xwe re
Dıvê bırabe

Kû kurekî mın çêbıbe
Ezê navê wî dînım
jîn
Aborî
Hılberîn

Ne wek ê mın
Nûrelah
Û ne wek êBavê mın
Sulhedîn.

Institut kurde de Paris

Kû kurekî mın çêbıbe
Dıvê destê wî bıghê Rojê
Û lıngê wî bıghê bınê Bahrê
Û tım dı bîr xwe de bîne
Huvdê Oktobırê

Kû kurekî mın çêbıbe
Dıvê hezbıke jı renga
Gewrık,
Reşık,
spî û zer
Bı gışkare bı v'brader.

Kû kurekî mın çêbıbe
Ne wek bavkalên xwe xwîn xwar
Ne wek Kalên xwe dîndar
Û wê ne wek mın bındar be
Ne wek bavpîran nezanbe
Û wê ne we k'Dîya xwe xulam be
Kû kurekî mın çêbıbe
Dıvê awırên wî bıbıre hesın
Jı Axê bıafırîne xwarın
Û pê çêke
Parêzgeh û avanî yên mezın

Institut kurde de Paris

Kû kurekî mın çêbıbe
Dıvê roja ewıl
Raje pênûs
Û roja dî bıteqîne çek
Tım bo jînê bıgere bı rext
Ne we k'Dêya xwe bext reş
Ne we k'hına bê bext
Û wêne wek mın bındest be

Kû kurekî mın çêbıbe
Ezê navê wî bıkım erd
Ezê navê wî bıkım ezman
ne dîn
ne îman

Dıvê bıxebıte
Kar bıke
tım bo jînê
tım bo însan.

Institut kurde de Paris

BONÎ ÇI HATIN?..

Ew hatın,
Ketın rê û hatın.
Jı bareş hatın.

Ne bo aşîtî,
    bo ked xurî,
        bo ax mêtî,
Bo xwîn mıjî hatın.

Feşkılandım,
Jı hev d'xıstım
Kırım neyar ez bı xwe û xwe.
Bo bıqeşıtım
  Bıqeşıtım,
        jı vê erdê.
Bo mahcır bım
Lı çola bım
Ez bê cî bım
        tım lı dınê. . . .

Institut kurde de Paris

Bo nebînım şewqa rojê,
Bo nebînım wekhevî yê
Bog nemînım
lı darê
dınê
Bı wê ket rê
Bı wî hawî
wan xwe karkır
û ew hätın.
Jı hev d'xıstım
Kırım parî
Perçe kırım
Dî s'kırım parî
Nehatın ser bı vêna jî
Tıxûp danîn û dûv re qember raxıstın
Bı hust
bı gava

Ev ax
Axa fıreh
avıs kırın
jı qembera

Institut kurde de Paris

Û wan,
Wan dîsa
Bı azînek çewt
êrîş
anîn.
Tım kuştun
Û tım tazîkırın
Kırın karê xwe,

Bı wê ket rê
Bı wî hawî
wan xwe karkır
û ew hatın.

Institut kurde de Paris

WERIN BI ME VE

Xwîn,
Xwîn dıfûre îro
Xwîn dıpejıqe
Xwêdan dıbe gol
Wek çem dıherıke
Pê bîstan û tene tê av dan
Erdê şıl dıke
Dê weleda davê îro
ceng,
ewr,
mıj

Û dûxane îro.
Tu lı dujmûn
Lı dujmun bınêr
Zeyıf bû ye
Bû ye wek zîro.

De werın
Werın bıme ve

Institut kurde de Paris

Bırevın,
Bı mev bıgên
Bı hêz bın jı me re
Werın xweyıno!
Werın hevalno!..

Gır...gıra ewre
Tereza davê
Ber û baran tev tên xwarê
lı hemberî zîro
ezê xwe bıgırım
xwe bıjdînım îro
Berf û xwêdan
Xwîn û baran
Tev hev bû ye
Erd sor bû ye jı gışkan
Werın,
Werın bı me ve
Werın bı bazdan

Institut Kurde de Paris

CAREK ZEPT BIKIM...

Kû carek zept bıkım
kû carek bıgrım ez
Wê rê ya yek ta
Kû destê mın bıghê çerxa cîhanê
Carek dın
Ez bernadım
Wernaqılım
Venagerım
Lewra pır hatım xapandın
Dı jina bûrî de

Institut kurde de Paris

BILA FEDÎ BIKIN

Bla fedî bıkın,
Bla fedî bıkın, mal xurên mezın.
xwedî gund,
xwedî erd,
axa û beg

Bla jı xwe fedî bıkın.
Mendalno!
Jın û zılamno!
Kal û pîrno!
Ên kû em kırıne mahcır
Bê cî war
Bırçî û jar hıştıne
Û ên kû
Em tım hıştıne
Nezan û bın dar
Dıvê kû em wana nas bıkın
Û jı wan re bêjın
Bla fedî bıkın
û bla bımırın
wenda bıbın

Institut kurde de Paris

SIBEKÊ

Sıbekê em rabûn
Qîrîn tê û gazî
Zûr...zûra panzêrâ tê
Bı dıl nexwazî
Ew her bera dıbarîne
Weke baranê
Jı jor tên xwarê
Dıkuje bava
Sêwî dımînın
zarok
lı malê

Mendal û mezın
Tevde dılezın
Dıkevın hundur
jı dıl
dınalın

Institut kurde de Paris

Hîn jî pır deng tê
Qember dıteqın
                    agır
                        jê hıltê
Tên kuştun însan
Însanên feqîr
Însanên bı jan.

Institut kurde de Paris

# EZ WANA NASDIKIM

Ez nasdıkım
Ez wana baş nasdıkım
Wana...
Ên kû dı bandeva spêde hatın
Wana bı fen hatın
Bı çek û kêr
Da kû bıkuje
Kal û pîr
Sûtal û mendal
Û jın û mêr.
Ez nasdıkım wana
Wan xwîn rıja
Wan mal xurna
Dewsa wana,gıha lê şîn nayê
Dujmunên însananın ew
Dujmunên xweza...

Institut kurde de Paris

## RÊ YA TE PÊKEVE

Ku tu here
Ku rê ya te pêkeve
Sılava lêke
Sılava jı mın-
Jı mın,sılava bıbe jêre
Sılavên evînî,
Dıl ketî,
Û bengîtî yê bıbe jêre.
Sılavên germ
Jı vır,
Sılava bıbe bılbıl.
Sılavên jı dıl...

Institut kurde de Paris

DAXWAZ YA MIN YA TALÎ

Mın dıvê yek zman
Yek netewe
Û yek Al

Mın tıxûp navê
Ne paseport
Ne maldar...

Institut kurde de Paris

## EVÎNA MIN

Mın evînek heye
Jı mın dûr,
Jîr û belengaze...

Mın evînek heye
Dareng,
Dîlber û awaze...

Mın evînek heye hevalo!
Stembar
Zayok û nemırde...

Institut kurde de Paris

## BI ÇWÎKEK BÛMA

Ez bı çwîkek bûma,
Bıfıryama berbı ezmana
Mın lı bın bazıkên xwe bınerîya
Lı ser erdê
            lı însana,
Ên hındık naxebıtın
Û xwedyên mılyonan,
Pırê wan
          bê nan
              û bê avın.
Ev çıma?
Jı sazumanê ye
Sazumana wan
Sazumana xwar
          sazumana çewt
                  sazumana ne însana
Lê jorde bınerın
            lı ser erdê
                lı însana.

Institut kurde de Paris

Ên dıgerın bı teksî
û bı fronekan
Ên ker û erebe nakeve dest wan
Ên rûdınîn lı serobın û lı koşkan
Û ên çadır û koxık
nakeve
dest wan
Ma yekîtî eve jıbonî însan?
Jorde bınerın
lı ser erdê
lı însana.
Ên dıxwun goşt û bırıncê
Û vedıxun şûşê araqê
Ên nan û pîvaz
bı dest wan
nakeve
Û tasa avê
Ma bı saxî dı gorê de
tım para me ye
hê!..

Jorde bınerın
lı ser erdê
lı însana.

Institut kurde de Paris

## AZADÎ XWAZIM

Bısekının!
Hînzaromım lı mın mexın
Mın megerın
Mın sax mekın
Bısekının!
Bıfıkırın jı xwer carek
Bıfıkırn kûr û dırêj
bıfıkırın
mın nekujun
lı mın nexın.
Ez gedemım dev dı pêsîr
Navêtî me dranê şîr
Vî canê mın î wek hevîr
lı mın mexın
mın megerın

Institut kurde de Paris

Bısekını!
Apê leşker
Hûn nebın ker
Ez nû hatım
Şewqa nu mım
Da ku zulmdara bıdım der
lı mın nexın
mın nekujun

Ger naxwazıbım aşîtî
hûn lı mın xın
Ger naxwazıbım wek hevî
dî s'lı mın xın
Ger naxwazıbım serxwebûnî
çavên mın der xın
Ger naxwazıbım hevpışkî
mın bıkujun
tım lı mın xın
mın serjêkın

Institut kurde de Paris

Yek sanıyê bısekının
Jı wer bê jım ez ya talî
Daxwazya xwe jı wer bê jım
Hûn zanın heê?
Ma hûn zanın?
Sûtalê qırnê bîsta mım
Dı zıkê dê ya xwe ya têkoşervande gıha mım
Û
Lı ber destê bavê xwe î karker

Institut kurde de Paris

Bı zulmek dıjwar hatıme dınê
Bê pîrık,
Dı şevek berfê de
şevek sar
dırêj
û reş
Şevek tarî bê lampe.
Jı zıkê dîya xwe hatım xwarê
Wek gomakî ketım
Dewsa mın kort bû
Wek qolîtkên bıharê

Mı hıngî nas kır
Derb dıjwarım bı hêzım
Bısekının xelas ne bû
Bıkurtayî
jı we r'bêjım
Dê ya mın dıgot
Bıkın xebat, tım bıkın şer,
Va kedxur na hûn bıdın der
Tune yê destpêk
Ne yê talî
Tu jî bımır
Bımır kurê m'bı mêranî

Institut kurde de Paris

Bıjî gotınên dê ya mın ya pîr
Bımre zulmdar
Bımre maldar
Bıjî xebat
Her bımırın hûn
Ber welat de va şehîd çûm.

Institut kurde de Paris

# TU JÎ WERE DAYE

Dayê tu jî,
Dayê tu jî pêşmala xwe bıjdîne
Wan gulyên hûnayî
Gulyên kû spî bû ye
Jı rengên berfê
Dı nava serê xwe de grê bıde
Gırêde dayê
Û
daw û delıngê xwe hılde
Gava ramedîne
bılezîne
û were
Were lıng mın
Dı mıl mın de rûne dayê
Dı mıl mın de bılîrîn
Mılê mın bıhejî N'
Mın hêrs bıke
Hêrsa bıde mın dayê
hêrsa...

Institut Kurde de Paris

## KANÎ?..

Bêje dayê wana kanî?
Ka bavê mın?
Kekê mın ka?..
Ka heval û hogırên mın?
Kanî dayê?
Ew gışk kanî?..

Ewan şevên heyvron dırêj
Ew şefaqa bı dengên dîka
Û wan rojên bê tırs û xof
Bêje dayê,
Ew dem kanî?..

Ew hevalna
Ew cîrana
Ewan xort û qîzên xama
Ew razana lı ser bana
Bêje dayê
Ew kêf kanî?..

Institut kurde de Paris

## DIVÊ ÊDÎ...

Êdî hedan lı mın nema
Aram nema
DIvê bıqelışînım.
Zıkê erdê,
Bıçırînım.
Pelên dîrokê,
Pelên çewt.
Û bıqetînım.
Zıncîrên zordestî,
Ên mêtıngehkarî,
Bı ber lıngadım.
Çewtî û xwarî
Ava bıkm.
Nûvre ava bıkım. vî warî...

Institut kurde de Paris

MA EZ TENÊ?...

Ma ez tenê gelo?..
Gelo ez tenê wamım?...
Bı tenê
Bê cî û bê warım
Tım hustu xwar
Reben û jarım.
Ma ez tenê gelo?..
Gelo ez tenê tım dınalım?...

Institut kurde de Paris

## JI ŞEHÎDÊN NEMIR RE

Hûn xweş razên Ronakbîrno
Xweş razên hûn,
Bê kul û xem.
Xweş razên, Karker Gundîno
Bo me hûn qet nexun xem.
Hûn xweş razên şewqa me
Xweş razên şehîdên me
Bawer bıkın hûn jı me
Em dımalın xwîna we
Bılınd dıkın Ala me...

Institut kurde de Paris

## DI HUNDURKIDEMIM

Dı hundurkîdemım.
Xerabe,
Bê şıbake,
Ser ax û tarî.

Dı hundurkîdemım.
Sar,
Bê sobe,
tev bêhna zıbıl.

Dı hundurkîdemım
Lı pışta gund
bı serê xwe
ez weke kund.

Dı hundurkîdemım.
Bı mara r'cîran,
bı kêzıka r' dost,
bı gêrıka r' rêwî,

Institut kurde de Paris

Lê dî s'bang dıkım
Û dıqîrım
Dıbêm
Nayê perçekırın
Tevger û tıfaqa welatê mın.
Bawerım û zanım.
Lı hawîr mın
  paçıkên sor
    kırıne rêz
      kırıne dor
Namırım.
   hıldıkşım jor
Hıldıkşım jor...

Institut kurde de Paris

## BONÎ ÎNSANA

Ez cengvanım lê...
Ceng naxwazım ez
Bonî însana,
Bonî ax û pez.

Ez cengvanım lê...
Ceng dıxwazım ez
Bonî însana.
Bonî ax û pez.

Institut kurde de Paris

DARINGIM

Ne jı Adem,
Ne jı Hewa.
Ne jî bı qulhû-wela
Lawê xweza mım.
Jı darıng hatıme afırandın.

Zık bırçî
Guh têrê derewa mım.

Ne jı Adem,
Ne jı Hewa mım.

Hedana mın,nîne
Jı çîrokên bê bıngeh
Ne muslumanım
Ne jî fıleh
Û
Ne nasê
Încîl û quranım

Institut kurde de Paris

Darıngım.
Darıng parêz
Lawê xweza mım.

Institut kurde de Paris

ŞÎRET

Kû ez pîr bûm
Gelî xortên nû hatî...
Ez nû hîn bûm.
Bûm naskırê vî welatî...

Hûn nexapın
Nebın wek me pêşî ya
Vê şîreta mın î bı gazın
Ne lı yekî, lı we gîya...

Institut kurde de Paris

# MÊRÊ MIN

Mêrê mın.
Ne bı roj dıderê,
Ne bı şev dıderê,
Fıkrê wîna wek fıkrê kerê.

Mêre ew lê!..
Wek jınên xerap,
Mêre ew lê!..
Mêrekî xerap,
Cıxare û araqî
Nakeve j'dest wî,
Kuflet re dıbêje
Hûn bımî n'sêwî,
Ne lı me dınere
Û ne dıkene
Kumê wî lı serî
Dest lı ber rwê wî.

Institut kurde de Paris

Mın got jınıkê r'
Bıpırse jı wî

Jınıkê got mın
Pırın kulê wî
Pırın derdê wî

Bavê sûtalê m'
Ka lı mın bıner
Kêlîkê rabe
Her jı xwe r'
Bıger
Ev çı kul û derd
Kû tu dıkşîne
Pır hene wek me
Bê mal û cîne

Jına mın ez rabım
Bı kûde herım
Nıkar bımeşım
Ezê wergerım
Dehyndarên fıraxa
Lı mın dıgerın

Institut kurde de Paris

Mın dıvê bımrın
Mın navê bımrım

Mêrê mın başe
Mêrê mın rınde
Em ser bılındın
Ew ser bılınde.

Institut kurde de Paris

## JINA MIN

Jına mın,
Bıroj nayê mal
Bı şev tê dereng
Ku tê ew dereng
Cılê wê reng bı reng
Û bîskeka dın jı derî tê deng

Derî vedıkım
Bı koma zılam
Dıkevın hundur
Nadın mın selam
jına mın bı dost
jına mın kahp
jına mın bû bela serê mın
Ne karı bıkujum
Ne karı berdım

Institut kurde de Paris

Jı derdê wê na
Bı şev ranazım
Dı dılê xwe de jı xwer dıgazım
Nakeve jı dev mın
Cıxara tûtın
Û qet tuneye jımır rûnıştın
jına mın
jına mın
jına mın

Bû bela serê mın
Ne karı bıkujım
Ne karı berdım...

Jı devê gundî kî.

Institut kurde de Paris

## ÇIMA BEJIN ZIRAVE?

Çıma bejın zıravê?
Çıma evqa tu hustu xwar bû ye îro?
Çıma hêsrê te tên xwarê
Wek dılopa
Dılopên xanyê dıl bı kula
Û wek baranê
Barana destpêka bıharê
Serê xwe hılde,
Bılınd bıner evîna mın.
Tu bıhûne
Wan gulyên xwe yî reş,
Dı ser wê bejna zırav de berde,
Berde bıskên sorsınî
Û jı bîr bıke
Wan kulên kevın.

Institut kurde de Paris

......

Bı kotek û bı zorê
Tu gel nakevın gorê.
Bı kuştuna zulmdara
Gel naqelın tu cara...

Institut kurde de Paris

## DU NÊÇÎR HEYE

Du nêçîr heye
Yek ya şêr
Yek ya tajî

Du nêçîr heye
Tu jı van herduwa
Kîjanê dıxwazî?

Nêçîr vanê tajî
Beza û bı leze
Nêçîrvanê şêr
Zana û bı derze

Dunêçîr heye
Yek ya şêr
Yek ya tajî

Nêçîrvanê tajî
Ne bo xwe dıbeze
Dılezîne beza ye
Pır dıbeze

Institut kurde de Paris

Nêçîrvanê şêr
Her bonî xwe yî
Ew bı heş û mêjî
Zana û jîrî
Ne bonî kesî
Bo xwe dızûre

Du nêçîr heye
Yek ya şêr
Yek ya tajî

Tajî dıbeze
Lı pe y'kîroşkê
Kîroşk dı pırse
Jı tajî roj kê
Hey lo...lo!
Lo guh pêlo!
Bê aqılo tım j'xelkê ro
Ev beza te ya lı pey mın
Carek bıpırs lı halê mın
Tu goşt naxwî
Tım hestî
Tu jî wek mın bındest î

Institut kurde de Paris

De jı xwe re bıfıkır
Bersîv kê bıde jı dıl

Tajî fêmnekır rabû
Êrîş bır û çû ser zû...

Nêçîrvanê şêr
Lı ser çîya ye
Lê berî jî tım
Jêv re xuyaye
Ew tım şer dıke
Bı pîsê jakaw re
Seyda wî ewe
Tım bo jînek xweş
Jakawê dev bı xwîn
Wî pîsê teres
Dev jê bernade
Dare ser bı lez
Lê kû dızûre
Deng dıbe olan
Bîrê de nayê
Ne av û ne nan

Institut kurde de Paris

Bonî xelasî
Bo serfırazî
Armanca şêre
Tım bı ke gazî

Du nêçîr heye
Yek ya şêr
Yek ya tajî

Du nêçîr heye
Tu jı van herdû wa
Kîjanê dıxwazî?..

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Mın evînek heye,
Jı mın dûr,
Jîr û belengaze...

Mın evînek heye,
Dareng,
Dîlber û awaze...

Mın evînek heye,hevalo!..
Stembar,
Zayok û nemırde...

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
· BIBLIOTHÈQUE ·

K.L